



**K.T.**

**Zanîngeha Mardin Artukluyê**

**Enstîtûya Zimanên Zindî yên Li Tirkîyeyê**

**Şaxa Makezanîsta Ziman û Çanda Kurdî**

**Projeya Mastera Bêtez**

**DERMANÊN GELÊRÎ LI GUNDÊN HATXÊ, KÛÇÛKA Û  
EMBARÊ YÊN MÊRDÎNÊ**

**İsmail ÜSTEMEL**

**14721056**

**Şewîrmend**

**Doç.Alk. Dr. Necat KESKİN**

**Mêrdîn 2018**



K.T.

Zanîngeha Mardin Artukluyê  
Enstîtûya Zimanên Zindî yê Li Tirkiyeyê  
Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Projeya Mastera Bêtez

**DERMANÊN GELÊRÎ LI GUNDÊN HATXÊ, KÛÇÛKA Û EMBARÊ YÊN  
MÊRDÎNÊ**

**İsmail ÜSTEMEL**

**14721056**

**Şêwirmend**

**Doç.Alk. Dr. Necat KESKİN**

**Mêrdîn 2018**

## NAVEROK

Naverok.....	I
Kurte .....	IV
Özet.....	V
Daxuyanî.....	VI
Beyanat.....	VII
Pêşgotin.....	VIII

### DESTPÊK

1. Mijar û sînorên Mijarê.....	1
2. Armanç û giringî.....	1
3. Rê û rêbazên Mijarê.....	1
4. Pirsgirêkên Mijarê.....	2
5. Pênase û Naverok.....	2

### BEŞA YEKEM

#### AGAHIYÊN GIŞTÎ DERBARÊ SEHAYÊ DE

1.1. Agahiyên Derbarê Gundê Hatxê.....	3
1.2. Agahiyên Derbarê Gundê Embarê.....	3
1.3. Agahiyên Derbarê Gundê Kuçuka.....	4
1.4. Pratîkên Olî Ji Bo Çareserkirina Nexweşîyan	
1.4.1. Xwendina Ayetan û Serdana Ziyaretan	
1.5. Li Ser Nebatan Çend Gotinên Pêşîyan.....	4

### BEŞA DUYEM

#### LI GUNDÊ MÊRDÎNÊ NEXWEŞÎ Û DERMANÊN NEBATÎ KU TÊN BIKARANÎN

2.1. Serêşî.....	6
2.2. Sergêjî.....	6
2.3. Kuxik.....	6

2.4 Şewb û Bapêş.....	6
2.5 Êşa Çava.....	7
2.6 Sînûzît.....	7
2.7 Xizok (Astım) .....	7
2.8 Werimandina Dest û Ligan.....	7
2.9 Şikestina Dest û Ligan.....	7
2.10 Kunêr.....	7
2.11 Bîrov.....	7
2.12 Bronşît.....	7
2.13 Zerdik.....	8
2.14 Pizik û Elem.....	8
2.15 Serşikestin.....	8
2.16 Terikandin.....	8
2.17 Zikêşî.....	8
2.18 Navçûn.....	8
2.19 Bawesîr.....	8
2.20 Şewitîn.....	8
2.21 Mar veda bûn.....	8
2.22 Bayê Guzana.....	9
2.23 Kevirê Gurçikan.....	9
2.24 Êşa Diranan.....	9
2.25 Mîstanik (Mantar) .....	9
2.26 Tansiyon.....	9
2.27 Qolesterol.....	9
2.28 Ta girtin.....	9
2.29 Gurîbûn.....	9
2.30 Kereng.....	9
2.31 Mewîjok.....	9
2.32 Şewliqandin.....	9
2.33 Qebizbûn.....	10
2.34 Virikî.....	10
2.35 Xur.....	10
2.36 Qolinca Adeta Jinê.....	10
2.37 Moristan.....	10

2.38	Êşa Kabokan.....	10
	<b>ENCAM.....</b>	<b>11</b>
	<b>ÇAVKANÎ.....</b>	<b>12</b>

## KURTE

Ev xebat ji ber ku di warê tîba gelêrî de çavkaniyên nivîskî pir hindikin bi serzêdekirineke nacizane hatiye amadekirin. Ji ber çî dibêjin dermanên kurmancî an dermanên gelêrî ,tîba gelêrî,tîba alternatif?

Dîroka dermanên kurmancî an jî tîba gelêrî li ser rêbaza ceribandî û çewtiyê hatiye avakirin. Ji bo nexweşiyekê an jî êşekê, bi pîranî jinan, ji bo bi şîfa be; Carînan cûreyek nebatan an cûreyek şînahiyekê li ber rojê hişk kirine û wekî amadekirina çayê di nav avê de kelandine. Ew çay dane nexweş ku nexweş pê rehet bibe. Carînan cûreyek nebatekê an şînahiyekê di hêwan de di eciqandî û bi cihê ku birîn an werimî be didan ku rehet bibe nexweş. Carînan jî bi riya derûnî çareserî digeriyan û berê xwe didan melle û şêxan. Baweriya xwe, bi xwendina ayetekî pîroz an jî serdana ziyareta gora yekî olî dikirin ku bi vê sedemê xweda şîfa bide nexweş.

Derman çî be jî, wexta ku zêde zêde hat bikaranîn dibe ku mirov xeraptir bibe. Zanistvane kî bi navê Paracelsus dibêje ku; Her tişt jehre, cûdahiya jehr û dermanan doz e pîvane.

**Bêjeyên Sereke:** Dermanên kurmancî, dermanên gelêrî, nebat, şînahî, nexweş, şîfa.

## ÖZET

Bu çalışma anonim tıp alanında yazılı kaynakların çok az oluşundan dolayı nacizane bi katkı amacıyla hazırlanmıştır.Neden kürçe ilaçlar,anonim ilaçlar,anonim tıp yada alternatif tıp deniliyor?

Kürçe ilaçlar tarihi ya da anonim tıp tarihi, deneme yanılma yöntemi üzerine kurulmuştur. Bir hastalık ya da bir ağrı için çoğunlukla kadınlar, şifa olsun diye; bazen bir çeşit bitki ya da bir çeşit yeşilliği güneşte kurutmuşlar ve çay hazırlar gibi suda kaynatmışlar. O çayı hastaya vermişler ki iyileşsin. Bazen bir çeşit bitkiyi ya da bi çeşit yeşilliği havanda ezmişler ve yara ya da şişen yere sürmüşler ki hasta iyileşsin. Bazen de psikolojik yollarla çare aramışlar ve imam ya da şeyhlere yönelmişler. Okunacak kutlu bir ayete ya da dini birinin mezarını ziyaret ederek bu sebeple hastalarına Allah'tan şifa dilemişler.

İlaç ne olsa da, eğer fazla kullanılırsa ihtimaldir ki hasta daha çok kötüleşsin. Paracelsus adındaki bilim adamı der ki; her şey zehirdir, zehir ile ilaç arasındaki fark dozdur, ölçüdür.

**Anahtar Sözcükler:**Kürçe ilaçlar,anonim ilaçlar,bitki,yeşillik,hastalık,şifa.

## PÊŞGOTIN

Berî her tiştî ez spasdarê dayîka xwe Zubeyda Ustemel û hevjiyana min Çiğdem Ustemel'im ku bi hemû enerjîya xwe û bi hêviya xwe yî pir hêja hertim piştgirî dane, spasiyên xwe peşkeşî wan dikim.

Di vê xebatê de kesê ku alîkariya nivîsê û fikr û ramanên xwe ji xebata min kêr nekiriye ji bo kurxalê min Dijwar AY spasiyên xwe pêşkêş dikim,

Di amadekirina vê xebatê de xal û xaltîk, ap û jinapên ku tercubên xwe yî pir girîng û hêja bi min re parvekirine spasiyên xwe pêşkêş dikim.

Ji gundê Hatxê Pîra min Şerîfe AY, ku bi temenê xwe 87 salî, xalê Nedîm AKYUZ(47), Ji gundê Kûçûka xaltîka Wetha(90),xaltîka Hukmiya(60), xaltîka Hesîna Kaya(62), Apê İbrahîm Kaya(77), xalê Alî KAYA (52), xaltîka Xenso Kaya (54), Xaltîka Hediya KAYA(60), xaltîka Nofa Kaya(58), xaltîka Eysanê KAYA(47), ji gundê Embarê Xalê Mihemedê Rajnî (Mehmet Tekin) (63), xaltîka Sultan Tekîn(54) û Apê Abid ZİNCİR (80) Spasî û hurmetê xwe pêşkêşî wan dikim. Ez ji wan razî me xwedê jî ji wan razî be înselleh.

Îsmail USTEMEL

Mêrdîn 2018

## **DESTPÊK**

### **1. Mijara Xebatê û Sînorên Xebatê**

Mijara vê xebatê di nav gel dibêjin dermanên kurmancî, yanî tîba gelêrî, tîba alternatif jî tê gotin. Di derbarê vê mijarê de bi nivîskî pir hindik xebat henin. Îro roj gel berê xwe didin xwarin û vexwarina organîk yanî li gundan çî tê xwarin û vexwarin li bajêr jî wê dixwazin ku ji ber yê gunda pirtirîn baştir e û nexweşî jê kêm çê dibe. Dermanên Kurmancî jî divê esasiyê de tîba hilbijartin. Ji ber ku ji nexweşa re li ser lînga berê wan didin emeliyat û yan jî bi qeflik dermanên febrîqasyon rehet nebûye berê xwe didin dermanên kurmancî. Pir caran jî dermanên Kurmancî nexweş rehet kiriye bi qeweta xwedê. Tîba modern pir deyndarê tîba gelêrî ye.

Ev xebat li gundê Mêrdînê Embarê, Hatxê û Kûçûka de hatiye amadekirin.

### **2. Armanc û Girîngiya Xebatê**

Armanc û girîngiya vê xebatê di derbarê tîba gelêrî de, pir çavkaniyên nivîskî hebin û ewên ku di derheqên dermanên kurmancî de pêşketîbin û xwedî tecrube bin, bîna nasîn û ev kevneşopiyên Kurdan ji bo ku neyê jibîrkin ev xebat hatiye meşandin.

### **3. Rê û Rêbazên Xebatê**

Rê û rêbazên xebatê ev bûn; anketên ku berê ji aliyê mamoste ve hatibû amadekirin em diketin gundan û me li kal û pîrên xwe ji gundiyan dipirsî. Li her gundekî 2-3 kesên ixtiyar hebûn. Me diçû pîrsên ku berê amadekirîbû weke sohbetekê dipirsî û dengên wan qeyd dikir. Paşê tiştên ku me di anketê de nivîsandiye derbasî xebata projeyê dikir.

#### **4. Pirsgirêkên Xebatê**

Ez dixwazim hişyariyekê bînim ziman. Divê çewt neyê fêmkirin ku di derheqên dermanên gelêrî de teqez divê bîn bikaranîn, an jî teqez wê bi kêr were, rehet bike ew tişt tune ne rast e. Tu garantî tune ye. Dibe ku baş bike, rehet bike, dibe ku rehet neke û ne çare be jî.

Di serî de jî hatiye nivîsandin ku dermanên kurmançî an dermanên gelêrî, li ser esasiya ceribandin û çewtiyê hatiye heta îro roj. Ji ber ku li hin nexweşan bûye çare û li hin nexweşan ne bûye çare.

#### **5. Pênase û Naverok**

##### **Çima dibêjin dermanên gelêrî an dermanên kûrmancî?**

Di dîrokê de ji ber şert û mercên dijwar, gelê kurmanç zêde ji gûndên xwe dernediketin. Çûna bajêr û nexweşxaneyê zehmet bû. Ji ber vê yekê mirovekî ku nexweş biketa bi derfetên derdora xwe bikardianin û bi piranî bi nebatên derdora xwe derman amade dikirin.

Dermanê modern tibê jî piraniyên wan ji nebatan tê çêkirin. Di pirtûka Edîp POLAT de bi navê “ Bilim Dilinde Kürtler” rupela 12. de tê gotin kû; “ Li ser rûyê gerdûnê de, nêzîka du mîlyon cûre nebat û ajal henin. Li erdnigariya Tirkiyê jî ji deh hezaran pirtir cureyên nebatan hene. Ji van deh hezaran de 3 hezar nebat endemîk in. Yanî tenê li herêma xwe şîn tîn, li cihekî din şîn nayên. Li herêma ku Kurd lê zêde dijîn pir ji wan nebatan hene ku dawîya navên wanî di zanista taqsonomîk de “Kurdîca, Kurda, Kurdistanîca, Carduca, Kurdîcus, Kurdîcum hwd...” hatiye bikaranîn.” Ji ber vê yekê dibejin dermanên kurmançî an dermanên gelêrî.

## BEŞA YEKEM

### AGAHIYÊN GIŞTÎ DERBARÊ SEHAYÊ DE

#### 1.1. Agahiyên Derbarê Gundê Hatxê

Li gundê hatxê nasnameya etnîk ya kesên ku niha dijîn Kurd in, li gorî ixtiyarên me berê jî li vî gundî Kurd dijiyan. Zimanên ku li gund dihat axaftin berê jî Kurmancî bû aniha jî Kurmancî ye.

Li gundê Hatxê û derdora Hatxê pirozbahiyên rojên taybet berê ev bûn; Cejn dihatin pîrozkirin, Li mizgefta gund kom dibûn û xutbê pêkdianîn. Aniha jî ev roj tînan pîrozkirin. Berê ji bo van rojên pîroz û taybet amedekarî bi vî awayî dihat kirin; roja cejnê xwarina kurmancî çêdikirin. (Tirşik, goşt, girar) û li mala digeriyan digotin werin bixwin û belav dikirin. Aniha şikir tînan belavkirin.

Ziyareta Omeranî, Ziyareta Qûzo. Ziyareta pîr kemal li derdora gund hene. Çîrokan van ziyaretan ev bûn: Pez li dora ziyaretê digerlandin û şîr dikirin mast û penêr. Li gundiyan belavdikirin. Çifte diteqandin digotin wilo baş e. Mirîşk serjêdikirin, kutilk çêdikirin û belav dikirin ji bo xêrê. Due dikirin digotin bila baran bê erdê me berke tînan. Dihat bawerkirin ku nexweşî bi saya wê ziyarete û due û bi qeweta xwedê wê rehet bibe.

#### 1.2. Agahiyên Derbarê Gundê Embarê

Navê Gund berê Embarê bû aniha Ambarlı derbasdibe. Di nava gund de tiştên dîrokî hebû. Jê re digotin Embar. Embara mewîja bû. Lê berê dêr bû dûra bû embar. Navê gund ji vir tînan. Nasnameya etnîk ya kesên ku li Embarê dijiyan berê Gawur bûn. Dûra Ermenî (filleh) bûn. Aniha li gund Kurd dijîn. Zimanê ku tînan axaftin Kurmancî ye.

Navê ziyaretên derdora gund ev in; Şêx Hemedê Lettanê, Derdivanê Qeynter, Şêxmûsê Hemedanî. Pîrek nanê xwe çêdikin, zilam due dikin, digotin bila xwedê rehmê bide.

Gundî ji bo nexweşiyên wan rehet bibin diçûn due dikirin. Mûlidê dixwînin û li mêj dikin. Heywan serjêdikirin, heywan li derdora ziyaretê digerandin. Mast, penêr, belav dikirin.

### **1.3. Agahiyên Derbarê Gundê Kuçuka**

Li gorî brêz Ali KAYA yê bi temenê xwe 52 salî, tehsîla wî dibistana seratayî ye, di derbarê gundê xwe de vana dibêje; Navê vî gundî berê belekê bu. Dura ji ber ku pir biçuk bu navê gund buye kuçuka. Ev mintîqa, koka wan yezidîne. Ziyareta têdeve. ziyareta şeptik û ziyareta pîrkemal heye li nêzîkî gund. Li dora gund hewdik hene û çal henin. Îro roj ji ber ku gund di beriye de ye her kesî ji xwere bîr kolandiye û debara xwe bi çandinî û şifêrtiyê dikin.

### **1.4. Pratikên Olî Ji Bo Çareserkirina Nexweşiyên**

#### **1.4.1. Xwendina Ayetan û Serdana Ziyaretan**

Tê bawerkirin ku êş an nexweşî bi çend heb xwendina ayetên pîroz derbas dibe. Carinan mele an şêxekî çend heb ayet dipêçandin û dikirin nivişt. Baweriya xwe bi wê niviştê dianîn ku ew nexweşî û êş û cinê nebaşiyê durbixîne. Carinan cureyên nexweşînan hebûn ku divê kesayetekî olî li ser bixwîne û êş û nexweşiyê bibirîne. Carinan ji nexweş divê bibin li ser gora yekî olî ku bi saya xwedê ev nexweşî ji mirov dûr bikeve. Bi duayan bi rojîyê bi mêjê bi serjêkirina qurbanekê jiber êş û nexweşiyê dûr bikeve. Xwîna qurbana ku hatiye serjêkirin, bi eniya mirov didin ku ji qeze û bela û nexweşiya bê parastin.

#### **1.5. Li Ser Nebatan Çend Gotinên Pêşiyên**

##### **Pîvaz:**

- Sibehê tu bixwe, nîvro bide dost û hevalê xwe û êvarê bide neyarê xwe.
- Sibehê biker û bixwe, nîvro belaş bixwe û êvarê di ser de heq jî bidin nexwe.
- Nan û pîvaz hebe nexweşî çavreşîye.
- Pîvaz, çi sor çi sipî.

##### **Giha:**

- Her giha li ser koka şîn tê.
- Giha di bin kevir de namîne.

**Êş:**

-Bila rû biêşe zik ne êşe.

-Êş hat ji Şam'ê, ecelhatî mirin.

**Nexweşî:**

-Çû dermanê mîzê gû lê esirî.

**Gûl:**

-Dinya guleke, behn bike û wê bide hevalê xwe.

**Qesp(xurme):**

-Diyarî qesp in, şûndiyarî hespin.<sup>1</sup>

---

<sup>1</sup> Ev biwêj û gotinên pêşiyên ji vê malperê hatine wergirtin: <https://occomahabad.wordpress.com>

## BEŞA DUYEM

# LI GUNDÊ MÊRDÎNÊ NEXWEŞÎ Û DERMANÊN NEBATÎ KU TÊN BIKARANÎN

Her çiqas bi vê rêbazê dermanên ku hatine amadekirin li hin nexweşa nehatibin jî bi piranî bi kêr hatiye ku gel heta îro roj ev kevneşopî aniye. Di dîroka tîba gelêrî de pir caran ji bo çareserkirina nexweşî û êşan, rêbaza ceribandin û çewtiyê hatiye bikaranîn. Hêviya ku dermanê ji bo nexweşiyê dûrbixîne, hemû di nav xwezayê de hatiye lêgerîn. Piştî ku ji nav xwezayê nebatek an jî şînahiyek hatibe hişkirin û weke çayê bê amadekirin, derman amade dibe û didin nexweş ku ji bo vedixwe çend caran û rehet bibe. Carinan ji ber ku devoka gunda hebikî ji hev du cudaye alîkarîkarî ji pirtukên “Ferhenga navên nebatan a kurdî” ya brêz Ahmet KASIMOĞLU û Ferheng a brêz D.ÎZOLÎ hatiye stendin.

Li sê gundên mêrdînê, çend heb kesên pir hêja û xwedî tecrubeyên ku dermanên gelêrî û amadekirina wan zanî bûn, dixwazim parvebikim.

### 2.1.Serêş:

Ji bo sereşê bêhna lawanteyê. pungê spî, naneyê, an jî bêhna tehtavikê baş e.Ç.1.

### 2.2.Sergêji:

Çay a zencefîlê an çay a sîngarê ji bo sergêjiye baş e. Di nav qedehik avê de kevçiyek hingiv û hinek ava lîmonê jî baş e ji sergêjiyê re. Ç.2.

### 2.3.Kuxik:

Ji bo kuxikê, hîro di nav şîr de tê kelandin û tê vexwarin an jî gezgezik di nav avê de tê kelandin û tê vexwarin. Ç.2.

### 2.4.Şewb û Bapêş:

Ji bo şewb û bapêşê gîhasevk tê hişkirin û wekî çayê tê amadekirin û tê vexwarin. Pîvaza biraştî jî baş e.Ç.5.

### **2.5.Êşa Çava:**

Kartola xav ku bê qeşartin û deyne li ser çavê ku diêşe baş e. **Ç.3.**

### **2.6.Sînuzît:**

Ji bo sînuzîtê petrîşok baş e. Petrîşok li ber avên ku diherike şîn tê. Navê petrîşokê, zebeşa tehle û ava zebeşa tehl berdidin bêvila nexweş. **Ç.6.**

### **2.7.Xîzok(astim):**

Berî taştê qedehek ava nane ya ku hatiye kelandin bê vexwarin baş e. Wekîdin xwarina hinar, gezer û pîvazê jî baş e ji astimê re. **Ç.12.**

### **2.8.Werimandina Dest û Ligan:**

Xwê, runê malê û muyê bizinan li cihê ku werimiye tê pêçandin û heta çend rojan rehet dibe. **Ç.13.**

### **2.9.Şikestina Dest û Ligan:**

Piştî ku dest an ligan hat cebirandin, hêk û hinne û xwê ya malê tê tevlihev kirin. Ev dermana ku hat amadekirin li dora cihê ku hatiye cebirandin didin û dora wê bi textan tê girêdan. **Ç.11.**

### **2.10.Kunêr:**

Pîvaza ku di nav pizota hatiye biraştin tê jêkirin û datînin li ser kunêrê. Piştî çend rojan derbas dibe. **Ç.11.**

### **2.11.Bîrov:**

Ariya êzinga û xwê şildikirin û tevlihev dikirin û bi cihê ku bîrov heye pê didan û dihat pêçandin. **Ç.12**

### **2.12.Bronşît:**

Tolik, pîvaz û hêk di nav piçek dohnê malê de tê qelandin û dihat xwarin. **Ç.13**

### **2.13.Zerdik:**

Ji bo zerdikê pişta guh pir hindik bi kêr dikirin û dihiştin ku hebikî xwîn jê were ku bawer dikirin ew xwîn, xwîna qirêj bu. Rêbaza din ew e ku; botav dikelandin û ava wê vedixwarin. Hatiye bihîstin ku nexweş mîza xwe vexwe jî ji zerdikê baş e. **Ç.1.**

### **2.14.Pizik û Elem:**

Bastêk didanîn ser pizikê ku elem biçuk bibe û bikeve. **Ç.14.**

### **2.15.Serşikestin:**

Hiriya miha dihat şewitandin û didanîn ser birînê û serê nexweş dihat pêçan. Çend rojan girêdayî dima û rehet dibu. **Ç.12.**

### **2.16.Terikandin:**

Şima, rûn û nebatek di bin erdê de ye navê wê reha hewa cewa ye, ev hemû dihat tevlihevkirin û di nav avê de di hat kelandin. Wekî melhemê bi cihê ku terikiye didan. **Ç.11.**

### **2.17.Zikêş:**

Heshesuk, qaşlê hinara û berru di nav hevde tê hurkirin û didan nexweş ji bo ku buxwe **Ç.10.**

### **2.18.Navçun:**

Çortan bi kêr hatiye. Çaya hur û mastê pez tevlihev dikirin û didan nexweş. **Ç.10.**

### **2.19.Bawesîr:**

Ganglok dihat xwarin û ji bo bawesîrê baş dihat. Wekîdin pelê hejîrê di birîna bawesîrê didan heta ku xwîn jê dihat û rehet di bû. **Ç.10.**

### **2.20.Şewitîn:**

Kartola xav hurhurî dikirin û didanîn li ser cihê ku şewitiye. Pişti ku êş kêmbu ji bo ku şopa şewtê nebîne divê sipiya hêkê tê bide. Ku elem çêbu be divê pelê silka lê bigerîne. **Ç.8.**

### **2.21.Mar Veda Bun:**

Gurîza hur kirî bi cihê ku mar veda be didan û dihat pêçandin. **Ç.9.**

### **2.22.Bayê Guzana:**

Tutin û hêk tevlihev dikirin û pê didan, nexweş rehet dibu. **Ç.3.**

### **2.23.Kevrê Gurcikan:**

Agul wekî çayê tê amadekirin. Nexweş vedixwe heta kevir bikeve. Rêyek din jî ew e ku; qaşlê hêkê dixin nav şûşeyek cam ku tije ava lîmonê ye û piştî rojekê dest bi vexwarina wê avê dike nexweş. Riya sêyem jî ; dirankrosk an bexdunis bi sere xwe tê kelandin û ava wê tê vexwarin her sibeh xurînê. **Ç.2.**

### **2.24.Êşa dirana:**

Ava ziqumê tê vexwarin. **Ç.7.**

### **2.25.Mîstanik(mantar):**

Hinnê dixînin nava hejîrê û datînin li ser cihê mîstanikê. Ava bahre jî dermane. **Ç.5.**

### **2.26.Tansiyon:**

Xwarina sîrê, pîvazê û ava hinaran a kelandî baş e. **Ç.6.**

### **2.27.Kolesterol:**

Guz koleterolê kêr dike. **Ç.6.**

### **2.28.Ta Girtin:**

Pelê guza tê kelandin û bi hinê tê nermkirin û bi serê xwe didan. **Ç.5.**

### **2.29.Gurî Bun:**

Sîr, xwe û mastê malê tevlihev dikirin û pê didan. **Ç.5.**

### **2.30.Kereng:**

Şîrkê hejîrê baş e. **Ç.5.**

### **2.31.Mewîjok:**

Hejîra reş datînin li ser pizikê. **Ç.4.**

### **2.32.Şewliqandin:**

Gihayê hinetîkê tê hurkirin û hinekî tê şilkirin duvre bi cihê ku şewliqiye didin. **Ç.2.**

### **2.33.Qebiz Bun:**

Xwarina çortanê qebziyê derbas dike. **Ç.2.**

### **2.34.Virikî:**

Toza qehwê û ava lîmonê tevlihev dîkin û didin nexweş. **Ç.2.**

### **2.35.Xur:**

Ava bahrê dermanê xurê ye. Germav jî baş e. **Ç.4.**

### **2.36.Qolinca Adeta Jinê:**

Dimsa germ tê vexwarin. **Ç.1.**

### **2.37.Moristan:**

Darê biya ê ter dixistin nav agir û ava ku ji darê dihat dixistin firaxekê. Piştî ku hebikî sar di bû berdidan ser moristanê. **Ç.4.**

### **2.38. Êşa kabokan:**

Qaşlê du heb lîmonan divê bixin şuşeyekê paqij. Ava zeytuna divê berdin ser qaşla ku heta bi ser qaşla kevi û deve şuşe tê girtin, heta 15 roja. Piştî hurhurî dîkin dibe wekî melhemê. Her êvar bi dora kabokan didin û sibeha jî bi ava sar û germî tê şuştin. Heta ku êş xelas bibe tê berdewam. **Ç.14.**

## ENCAM

Di encama vê xebatê de mirov fam dike ku bi rastî jî li gunda di warê çandî, ziman û tendurustiyê de dewlemendiyeke zêde heye. Jiyana bê stres, esasê tendurustiyê ye. Ziman li gunda pir hatiye parastin. Çanda gunda her çiqas ne wekî berê be jî hîn li ser xwe ye. Wexta mirov ji kal û pîran dipirse û lêdikole, pir agahî, fikr û raman derdikevin ber şewqa rojê. Mirov li ber ên ku rehmet kirine dikeve ku, kî zane çiqas dewlemendî bi xwere xistine binê erdê ku kesî lê nepirsî be û qeyd nekiri be. Dîsa îro roj li her gundî çend ixtiyarên ku çanda jiyana gunda berdewam dike henin.

Mirovatî ji gunda hatiye û ji gunda tê xwedî kirin. Dê demek were ku hemû mirovên li bajara dijîn dê vegezin gunda. Li gorî min; Îro roj jiyana gunda têra heye ku mirov lê vegere û jiyaneke bextewar û bi tendurustî berdewam bike.

## KESÊN ÇAVKANÎ

### Ç.1.

Nav: Wetha

Paşnav: Kaya

Temen: 90

Pîşe: Naxebite

Tehsîl: Nexwende ye

Gund: Kuçuka

### Ç.2.

Nav: Hikmiya

Paşnav: Kaya

Temen: 60

Pîşe: Xanima Malê

Tehsîl: Nexwende ye

Gund: Kuçuka

### Ç.3.

Nav: İbrahim

Paşnav: Kaya

Temen: 77

Pîşe: Cotkar

Tehsîl: Nexwende ye

Gund: Kuçuka

### Ç.4.

Nav: Ali

Paşnav: Kaya

Temen: 52

Pîşe: Şifêrê Tirê

Tehsîl: Dibistana Seretayî

Gund: Kuçuka

### Ç.5.

Nav: Hasine

Paşnav: Kaya

Temen: 62

Pîşe: Xanima Malê

Tehsîl: Nexwende ye

Gund: Kuçuka

### Ç.6.

Nav: Xenso

Paşnav: Kaya

Temen: 54

Pîşe: Xanima Malê

Tehsîl: Nexwende ye.

Gund: Kuçuka

**Ç.7.**

**Nav:Seyran**

**Paşnav:Kaya**

**Temen:40**

**Pîşe: Xanima Malê**

**Tehsîl: Dibistana Seretayî**

**Gund: Kuçuka**

**Ç.8.**

**Nav: Hediye**

**Paşnav: Kaya**

**Temen:60**

**Pîşe:Xanima Malê**

**Tehsîl: Nexwende ye.**

**Gund: Kuçuka**

**Ç.9.**

**Nav:Nofa**

**Paşnav: Kaya**

**Temen:58**

**Pîşe:Xanima Malê**

**Tehsîl:Nexwende ye.**

**Gund: Kuçuka**

**Ç.10.**

**Nav:Eyşanê**

**Paşnav: Kaya**

**Temen:47**

**Pîşe:Xanima Malê**

**Tehsîl:Nexwende ye.**

**Gund: Kuçuka**

**Ç.11.**

**Nav:Abid**

**Paşnav:Zincir**

**Temen:80**

**Pîşe:Mele**

**Tehsîl:Nexwende ye.**

**Gund: Embarê**

**Ç.12.**

**Nav:Mehmet**

**Paşnav:Tekin**

**Temen:63**

**Pîşe: Cotkar û Şivan**

**Tehsîl:Dibistana Seretayî**

**Gund: Embarê**

**Ç.13.**

**Nav:Şerife**

**Paşnav:AY**

**Temen:87**

**Pîşe:Xanima Malê**

**Tehsîl:Nexwende ye**

**Gund: Hatxê**

**Ç.14.**

**Nav:Nedîm**

**Paşnav:Akyüz**

**Temen:47**

**Pîşe:Cotkar û aşvan**

**Tehsîl:Dibistana seratayî**

**Gund: Hatxê**

**ÇAVKANİYÊN NÎVÎSKÎ:**

Îzolî (2013). Ferheng. Istanbul: Deng-Yayınları

Kasımoğlu, Ahmet (2013). Ferhenga Navên Nebatan a Kurdî. Mardin: Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları

Polat, Edip (2004). Bilim Dilinde Kürtler. Istanbul: Evrensel Basım Yayın

4.<https://occomahabad.wordpress.com:Gotinên pêşiyên>



**T.C.**  
**Mardin Artuklu Üniversitesi**  
**Yaşayan Diller Enstitüsü**  
**Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı**

**Tezsiz Yüksek Lisans Projesi**

**MARDİN'İN YANDERE, GÜNEYLİ VE AMBARLI KÖYLERİNDE KÜRT  
HALK BİLİMİNDE KÜRTÇE İLAÇLARIN YERİ**

**İsmail ÜSTEMEL**

**14721056**

**Danışman**

**Yrd. Doç. Dr. Necat KESKİN**

**Mardin 2018**